

Bidestveanîna mafên neteweyî
yên gelê Kurd di çarçoveya
Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 93
15'ê Tebaxê
Buha: 150 Tûmen

agiri

Cejna 25'ê Gelawêjê
Bi Coşeke Germ û
Girse yî Hate
Pîrozkirin
R. 4-5



Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê diweşîne

63 SAL XEBAT Û BERXWEDANA PDK ÎRANÊ DÎ RÊYA AZADIYA KURDISTANÊ DE

Poster: Reûf

Hevpeyvîna Rojnameya
"Eleftherotipia"yê, Tevî
Mistefa Hicrî



2

Pêvajoya Îdaman Li
Îranê Berdewam E



3

Bizava Siyasî A Kurd Ji
Nêrîna Dîroka Siyasî Ve



5

Îdamkirin, Kuştina Vênî
Ji Aliyê Dewletê Ye



7

TIXÛB



9

Dr. Xosro Ebdulahî Di Hevpeyvîneke Taybet Bi
Agirî Re:

"DR. QASIMLOYÊ NEMÎR
HÎMDAR Û PÊŞENGÊ
NAVNETEWÊYÎKIRÎNA PÎRSA
KURD BÛ"

Hevpeyvîn Di Paşkoya Vê Hejmarê De



Rêzdar Mistefa Hicrî Di Hevpeyvînekê De Bi Rojnameya "Eleftherotipia" Re: "BÎ BOMBEBARANKÎRÎNA BÎNKE Û NAVENDÊN ETOMÎ, REJÎMA KOMARA ÎSLAMÎ NAHILOŞE"

W ji Yûnanî: **Azad Ezîzî**

Hevpeyvîna han li 27.07.2008'an, di rojnameya "Eleftherotipia" ku pirtirajtirîn (200000) rojnameya

Yûnanî ye, çap û belav bûye. Kesê ku hevpeyvîn pêre pêk aniye "Nicos Zircanos", rojnamevanê herî binav û deng yê Yûnanî ye ku heya niha bi gellek kesayetiyên cîhanî re gotûbêj kiriye.

Birêz **Mistefa Hicrî**, mirovekî biwêr û hêja ye ku piştî terorkirina yek li pey yek a her du Sekreterên Giştî yên PDK Îranê, Sekreteriya vê partiyê li stû girtiye. Aligirê rêya demokrasiyê ye. Sekreterê partiyekê ye ku ji aliyê hikûmeta Tehranê ve neyasayî ye. Di halekê de jî ku welatê wî ji aliyê neyarên derveyî ve di bin gefê de ye, di malpera Internetî a vê partiyê de listeya hejmareke zaf ji Kurdên Îranê tê dîtin ku hatine îşkence û îdamkirin. Ew zarok û ciwanên ku têne daliqandin, ew jinên ku di girtîgehan de xwe kuştine û ew mêrên ku hatine bêserûşunkirin.

Birêz Hicrî daxwaza hiloşîna rejîma Tehranê dike, lê dijberiya xwe jî li hemberî egera êrîşa leşkerî bo ser binke û navendên etomî yên Îranê tîne ziman.

Di çarçoveya Kongireya Enternasyonala Sosyalîst de li Atenê, min hevdiînek tevî rêberê Kurdên Îranê encam da. (**Nilcos Zircanos**)

Herçend ku pirsra Kurd li Turkiye û Îraqê di nav medyayan de rengvedana vê heye, lê meseleya Kurdên Îranê gellek caran di tarîtiyê de dimîne, çi rewşek li devera we di holê de ye?

Rewşa Kurdên Îran, Îraq û Turkiyê berî hiloşîna rejîma Sedam Husên -bi hin cudahiyan ve- di astekê de bû. Derheq



pirsra Kurdên Îranê û herweha kêmetewên din yên Îranê, eva ye ku rejîma Tehranê zext û givaşê bo Kurdan ji ber nasnameya Kurdî a wan û herweha givaşên mesebî jî tîne.

Em berbirûyê dîktatoriya Siyasî û mesebî ne. Kurdên Sûriyê û Turkiyê tenê berengarê dîktatoriya siyasî ne, lê di Îranê de diyardeya mesebî jî pêve zêde dibe. Perek ji Kurdên Îranê Sunnî meseb in, lê Farsên Îranê, Şîî ne. Piştî çêbûna Hikûmeta Herêma Kurdistanê Îraqê, rejîma Tehranê dest bi zêde û xurtkirina givaşên li ser hevvelatîyan kir. Ew li ser vê baweriyê ne ku bi vê derfet û delîvêya ku ji bo birayên me di Îraqê de pêk hatiye, hêviyên me geş bûne û em dixwazin welatê xwe perçe perçe bikin. Hevvelatîyên me di dadgehan de hukim didin, îşkence dikin, digirin. Bi taybet endamên PDK Îranê tim armanca wan in. Partiya herî kevnar, dîrokî, bi nifûs û pir aligirtirîn hêz di Kurdistanê Îranê de ye.

Hûn tenê Otonomiyê dixwazin, yan eva ku Tehranê mafê vê hindê heye ku we tawanbar bi parçe parçe kirina Îranê bike?

Partiya me daxwaza perçekirina Îranê nake. Berevajî vê yekê, me tim jî bo mafên netewî û demokratîk di çarçoveya Îranê de xebat kiriye. Niha dirûşma sereke ya me "avakirina hikûmetek demokratîk a Federal e, ku tê de Kurd û netewên din yên Îranê xwedî nasnameya netewî a xwe bin. Em dixwazin hemû bi hev re biyîj û hikûmetê bikin ji bo rêzgirtin ji demokrasî û yasayê.

Bi li ser karbûna vê rejîmê, hûn li ser vê baweriyê ne ku bikarin bi armancên xwe bigihîjin? Hûn daxwaza hiloşîna vê rejîmê dikin?

Em li ser vê baweriyê ne, heya ku Komara Îslamî li ser desthilatê be, em nagihîjin armancên xwe. Ew ne tenê netewên Îranê bi fermî nas nake, belku

cehdê bo jinavbirina wan dide. Dixwazin her bizavek millî tepeser bikin. Ew bawer in ku maneya milletê, îdeolojiya Îslamê jar dike. Ew wiha difikirin ku Îslam take îdeolojiyek e ku hemû însanan li dora hev kom dike. Ji bo wan ne girîng e ku Kurd û Turk û netewên din hene, girîng ev e ku hemû Misilman in.

Pêwendiyên we bi Kurd û Partiyên din yên Kurdistanê çawa ye? Gelo armancên hevpar yên we hene? Hûn çawa mêzeyî egera çêbûna welatek mezin û yekgirtî bi navê Kurdistanê dikin?

Li ser pêşerojê çî nabêjim, partiya me li ser niha(hal) diaxive, renga nifşa pêşerojê li ser vê yekê biryarê bidin. Niha partiya me bawer e gelê Kurd di her parçeyek Kurdistanê de ku dijît, bikare bi azadî, pêşketin û gihîştin bi mafên demokratîk li ser xaka xwe bijît.

Lê we niha bona bidestveanîna armancên xwe, rêya aştiyê hilibijartîye û dev ji xebata çekdarî berdaye?

Îro, belê me metoda demokrasiyê hilibijartîye.

Lê Kurdên Îranê wek "PJAK"ê xebata çekdarî hilibijartîne?

Em li ser vê baweriyê ne ku PJAK'ê tu ferq û cudahiyeke bi PKK'ê re tune ye, perek ji PKK'ê ye û ji aliyê PKK'ê ve tê rênimayîkirin. Di warê leşkerî, aborî û siyasî de ji PKK'ê xet distîne û tê piştewanîkirin.

Me bi PJAK'ê re tu peywendiyek nîn e.

Niha cîhan bi kirîza çekên navîkî yên rejîmê re berbirû ye, herçend ku heya niha nehatiye selmandin ku Îran Çekên Navîkî çê dike, lê bi vî halî jî Îsraîl gefa bombebarankirina binkeyên etomî yên Îranê dike û Amerîka jî êrîşa nîzamî bi dûr nizane. Helwesta we li hember bombebarankirina welatê we çî ye?

Em li ser vê baweriyê ne ku her terze bombebarankirina Îranê ji i Îsraîl û Amerîkayê ve rejîma Îranê nahiloşîne. Berevajî vê yekê, rejîm dê xelkek zêdetir li dora xwe kom bike û dê serkeftina siyasî bi wan bombaran bidest bixe. Xelkê dê li dora xwe kom bikin, di halekê de ku welatê me avisê pirsên hundirîn yên xwe ye. Ger Îsraîl Îranê bombebaran bike, wê demê rejîma Îranê vê yekê dê weke çekek teblîxatî(propagandeyî) di nav welatên Erebi û Misilman de bikar bîne. Herwiha bombebarankirina Îranê derb û zîzarê ji bizava demokrasiyê di hundirê Îranê de dide. Bi vî sedemê ku bala cîhanê bo aliyê pîrsek din dikîşîne. Êrîşa leşkerî li dijî Îranê ne di berjewendî û qazancê xelkê Îranê de ye.

Pêvajoya Îdamkirinê Li Îranê Berdewam E

8 Girtiyên Siyasî Ên Kurd Li Ber Xetera Îdamê Ne

Azad Kurdi

Tevî derkirina biryara daliqandinê ji bo **Hebîbula Letîfî**, di roj 13'ê Tebaxa

2008'an, hejmara girtiyên siyasî û ramanê ên Kurd di zîndanên Komara Îslamî de ku cezayê neadîlane û nerewa yê îdamê ji wan re hatiye birrîn, gihîştê 8 kesî.

Daliqandina **Yeqûb Mêhrnehad**, Rojnamevan û çalakê sivil yê xelkê Belûçistanê di roja 4'ê Tebaxa 2008'an, bû sedema pêkhatina nigeraniyeke xurt a komeleyên mafên mirovan, partî û kesayetiyên siyasî û azadîxwaz ên Îran û Kurdistanê. Serbarê vê yekê ku îdamkirina Yeqûb(28 salî) bû sedema kul û kesera neteweyên Îranê û nerazîbûna komeleyên parêzerên mafên mirovan di asta navneteweyî de jî, tirs û nigeraniyeke zaf xiste nav dilê azadîxwazên Kurd li Îranê ku ev pêla nû a îdamkirina ku rejîma Komara Îslamî dest pê kiriye, nebe gefek bo ser jiyana girtiyên siyasî ên Kurd, nemaze 8 Kurdên ku bi îdamê hatine mehkûmkirin.

Îdamkirina rojnamevanê Belûç, Yeqûb Mêhrnehad, tirs daliqandina van 8 rojnamevan, mamosta û çalakên sivil ên Kurd jî zêde kiriye.

1. Ednan Hesenpûr, rojnamevan
2. Hîwa Botîmar, parêzerê jîngehê û çalakê sivil
3. Ferzad Kemanger, mamostayê xwendîgehê, çalakê mafê mirovan
4. Enwer Husên Penahî, mamostayê xwendîgehê û çalakê sivil
5. Erselan Olyayî, mamostayê xwendîgehê
6. Ferhad Wekîlî, çalakê sivil û mafê mirovan
7. Elî Heyderiyar, çalakê sivil û mafê mirovan
8. Herî dawî jî, **Hebîbula Letîfî**, xwendekarê Kurd ê şaxa Hiqûqê li zanîngeha Îlamê û akinciyê bajarê Sine ku payîza sala borî hatibû girtin, bi îdamê hate mehkûmkirin. Biryara han roja 13'ê Tebaxa 2008'an, ji parêzerê wî re hate ragihandin.

Letîfî di girtîgehê de bi xurtî hatiye îşkencekirin û heyamekê ji ber nexweşiyên ku di encama îşkenceyan de rastî wî hatibû, di nexweşxaneyê bajarê Sine de hatibû razandin. Letîfî



Wêne: Reûf

çalakekî sivil û mafê mirovan e ku herî dawî bi îdamê hatiye mehkûmkirin.

Di sala borî de heya niha, biryara îdamê bi ser dehan çalakên sivil ên Kurd, Belûç û Ereb hatiye sepandin û ji bo dehan û sedan nivîskar, rojnamevan, çalakên mafên mirovan ên neteweyên bindest ên Îranê cezayên giran ên zîndanê hatiye birrîn.

Her çi qas kêm jî be, lê nigeranî li dor jiyana û çarenivîsa wan girtiyên Kurd ên mehkûmbûyî bi îdamê, di asta navneteweyî de jî xwe derxist holê. Di çend rojên borî de, tenê Yekîtiya Ewropayê nigeraniya xwe derheq pêvajoya berfireh a bînpêkirina mafên mirovan li Îranê da xuyakirin. Di daxuyaniya vê dawiyê a YE'ê de, derbarê bînpêkirina sistematîk a mafê mirovan li deverên Kurakincî ên Kurdistanê Rojhilat, rejîma Îslamî a desthilatdar hatiye rexnekirin. Yekîtiya Ewropayê serbarê xuyakirina nigeraniya xwe ji rewşa bînpêkirina mafên mirovan li Kurdistanê Îranê, daxwaza betalkirina biryara sepandî bi ser girtiyên siyasî ên Kurd kir ku bi îdamê hatine mehkûmkirin. Tenê weşandina daxuyaniyeke wisa ne pêwîst e, hewce ye di piratîk de jî YE'ê û sazî û komele û heta dewletên demokratîk bona şermezarkirin û rawestandina vê pêvajoya xurt a bînpêkirina mafê mirovan di Îranê de, gavan bavêjin.

Di halekê de ku siyaseta kuştin, girtin, îşkence û îdama xelkê li seranserî Îranê bi xurtî û sistematîk didome, lê ji ber rojeva dosya Etomî a Îranê, rewşa xirab a bînpêkirina mafê

mirovan hatiye jibîrkirin, û raya giştî a navneteweyî herî zêde li ser bernameya Etomî a vê rejîmê disekine û bi awayê hewce balê nade pêvajoya xurt a bînpêkirina mafê mirovan li Îranê.

Derbarê vê mijarê de, xemsarî bêdengî û bê helwestiyeke jar û lawaz di asta navneteweyî de tê dîtin. Girtin, îşkence, îdam û kuştina rojane a xelkê Îranê ji wan re di dereceya çendem de ye, lê zext û givaşên herî zêde a welatên cîhanê bo ser rejîma Komara Îslamî derheq çekên Etomî û zaxkirina Uraniyûmê ji aliyê vê rejîmê ve bona çêkirina Çekên Etomî ye. Weşandina car û bar a daxuyaniyan nikare berlêgirtinê ji pêvajoya bînpêkirina xurt a mafên mirovan li Îranê bigire, belkî pêdivî bi vê yekê ye ku ew weke welatên demokratîk û berevankarên demokrasî û mafê mirovan, ji ber qazanc û berjewendiyên xwe, tenê li ser pîrsa Etomî a Îranê nesekinîn, hewce ye bala xwe bidin rewşa bînpêkirina mafê mirovan li seranserî Îranê û ji xemsarî û bêdengiyê derkevin.

Ji ber vê yekê, rejîma Komara Îslamî bi dilê xwe dest bi girtin, îşkence, kuştin û îdamkirina azadîxwaz, çalakên sivil û mafên mirovan û wd... kiriye.

Çarenivîsa 8 girtiyên siyasî ên Kurd yê mehkûmkirî bi îdamê di xeterê de ye, heke di asta hundir û navneteweyî de bona pêşgirtin ji vê prosesê gav nehên avêtin, tirs daliqandina van 8 girtiyane û gellek yê din heye.

Cejna 63'hemîn Salvegera Avabûna PDK Îranê Bi Coşeke Germ û Girseyî Hate Pîrozkirin

Bi armanca pîrozkirin û rêzgirtin ji 63'hemîn salvegera avabûna PDK Îranê, êvariya roja 15'ê, 25'ê Gelawêja 1387'an a Rojî(15'ê

Tebaxa 2008), rê û resmeke girse û berfireh di binkeya Deftera Siyasî a Partiya Demokrat ya Kurdistanana Îranê hate lidarxistin.

Rê û resm bi xwendina sirûda neteweyî a **Ey Reqîb** ji aliyê Koma Zarokên Kampa Azadiyê ve hate vekirin û piştê deqîqeyek bêdengî bona rêzgirtin û bibîranîna şehîdên rêya azadiya Kurd û Kurdistanê hate ragirtin.

Şahiya 63'hemîn salvegera avabûna PDK Îranê bi peyama rêzdar **Mistefa Hicrî**, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê dest pê kir. Birêz Mistefa Hicrî di peyama Deftera Siyasî de bal kişandibû ser dem û çawaniya avabûna PDK Îranê û bi hûrî û berfirehî aliyên pêkhatina yekemîn partiya demokrat, nûjen û xwedî bernameya siyasî a Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de şirove kir.

Piştê bas li ser rewşa niha ya siyasî a Îran û Kurdistanê kir û li ser hewcehiya yekîtiyê, hevxebatî û hevkarîya hêzên siyasî yên Îranê û Kurdistanê tekez kir û amadebûna PDK Îranê ji bo her hev girtin, hevberî û hevweberîyê di vê derbarê de îlan kir.

Deqa peyama rêzdar Mistefa Hicrî di paşkoya taybet a vê hejmarê Agirî de bixwînin.

Beşên din ên rê û resma 25'ê Gelawêjê di binkeya Deftera Siyasî de bi vî awayî bû:

- Sirûda "25'ê Gelawêjê" ji aliyê Koma Hunermendên Yekîtiya Jinan bi alîkariya çend hunermendên muzîkvan ên bajarê Koyê hate pêşkêşkirin.

- Peyama Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistanana Îranê ji aliyê **Hebîbe Abdulahî**, endama Komîteya Rêveberîya Giştî ve hate



xwendin.

- Hunermendê Pêşmerge **Bêhrûz Lutfi** bi pêşkêşkirina straneke kurmançî coşek germ da şahiyê.

- Peyama Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistanana Îranê ji aliyê **Kerîm Perwîzî**, Sekreterê Giştî yê wê rêxistinê ve hate xwendin.


- Zarokên Kampa Azadiyê sirûda "Bijî Kurdistan" xwendin û tevî pêşwaziya germ a beşdaran rû bi rû bû.

- Peyama Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê ji aliyê **Osman Yarî**, endamê Komîteya Rêveberîya Giştî a wê rêxistinê ve hate xwendin.

Çend stran ji aliyê hunermendên dengxweş ve hatin pêşkêşkirin.

Rê û resma pîrozkirina cejna 63'hemîn salvegera avabûna PDK Îranê bi govend û dîlana beşdaran bi dawî hat.

Li Bajarên Rojhilatê Kurdistanê Cejna 25'ê Gelawêjê Bi Berfirehî Hate Pîrozkirin



Bi boneya 25'ê Gelawêjê, 63'hemîn salvegera avabûna PDK Îranê, endam û alîgirên nepenî ên partiye li bajar û bajarok û gundên Kurdistanê, bi awayekî hêja û berfireh çalakîyên teblihî lidar xistin û pêşwazî ji cejna 25'ê Gelawêjê kirin.

Li bajarên Urmiye, Nexede, Şino, Pîranşar, Mehabad, Bokan, Bane, Seqiz, Merîwan, Sine, Dêwulan, Ciwanro, Kamyaran, Pawe û gellek cih û deverên din ên Rojhilatê Kurdistanê, endam û alîgirên nepenî ên PDK Îranê agirê 25'ê Gelawêjê li ser çiya û bilindahîyan hil kirin û dirûşm nivîsîn, traktên taybet ên vê boneyê hatin belavkirin û wêneyên rêberên PDK Îranê, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî jî hatin belavkirin. Çalakîyên han bi awayekî berfireh birêve çûn.

Li bajarê Mehabadê bi nîşana 63 sal xebat û têkoşîna PDK Îranê di rêya azadiyê de, ciwanên netirs û endamên nepenî yên partiye 63 şaxên gulana danîn ser gora nemir Pêşewayê Kurd Qazî Mihemed, rêberê Şehîd yê partiye.

Çend dîmen ji rê û resma binkeya Deftera Siyasî



Cejna 25'ê Gelawêjê, Di Navenda 3 A Kurdistanê De, Bi Coşek Germ Hate Pîrozkirin

R Oja 25'ê
Gelawêjê(15.08.2008)'an,
demjimêr 17'ê piştînivro, li

Navenda 3 a Kurdistanê, rê û resmeke berfireh û girseyî bi beşdariya nêzik hezar kes ji Kadro û Pêşmerge, endam û alîgirên Partiya Demokrat û her wiha nûnerên aliyên siyasî û kesayetiyên welatperwer, bi hinceta 63'hemîn salvegera damezrandina PDK Îranê hate lidarxistin.

Rê û resm bi xwendina sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdengî ji bo canê paqij yê şehîdên azadiya Kurdistanê dest pê kir.

Piştî Mihemedsalih Qadirî, berpîrsê Navenda 3 ya Kurdistanê, axavtinek kurt bi vê hincetê pêşkêş kir û daxwaz ji rêzdar Hesên Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê kir ku bi vê hinceta dîrokî, ji beşdarên rê û resmê re biaxive.

Hesên Şerefî di axavtina xwe de bal kişande ser çawaniya damezrandina PDK Îranê, rola vê partiyê di rêxistina xelkê Kurdistanê de bona bidestveanîna mafê neteweyî, destkevtên Partiya Demokrat di temenê xebata wê de û her wiha qala nifûza PDK Îranê di nava xelkê Kurdistan û Îranê û di asta navneteweyî de kir û bi nûkirina soza domandina xebatê heya serkevtinê tevî şehîdên Kurdistanê, dawî bi axavtina xwe anî.

Piştî peyamên Melbenda 18 a navçeya Xebatê ya Yekîtiya Niştimanî a Kurdistanê, Lêjneya devera Beranetî a Partiya Demokrata Kurdistanê, Komîteyên Hewlêr û Soran ên rêxistina eşkere a PDK Îranê, Yekîtiya Ciwanan, Jinan û Xwendekaran Demokrat ên hatin pêşkêşkirin.

Hêjayî gotinê ye ku di navbeyna beşên rê û resmê de, çend sirûd, helbest, pexşan û stran hatin pêşkêşkirin.

Rê û resm demjimêr 20'ê şevê, bi govend û dîlana beşdarên şahiya pîrozkirina 63'hemîn salvegera avabûna PDKÎ bidawî hat.

Bizava Siyasî A Kurd Ji Nêrîna Dîroka Siyasî Ve

Beşa 5

Bêhzad Xoşhalî *
Wergeran ji Farsî/ Omîd Esxeran

Ş oreşa Şêx Seîd di meha Şibatê de dest pê bû. Şêx Seîd yek ji kesayetiyên olî yên deverê û xelkê

herêma Gencê bû. Piştî bidesthilat gihîştina Mistefa Kemal li Turkiye û qels û lawazbûna desthilata Îslamî, Şêx Seîd li dijberî tevî Laîsîte û bi armanca berevanîkirina ji ola Îslamê li dijî hikûmeta nû a Turkiyê serî hilda.

Kiryar: Teverga Şêx Seîd Pîran
Sebeb: Kurdên li bakurê Turkiyê bi rêberiya Şêx Seîd

Biyav:
A) Dem: 1925
B) Cih: Başûrê Rojhilatê Turkiyê û piraniya deverên Kurdakincî ên wî welatî
Alav: Xebata çekdarî

Armanç:
1- Dijberî tevî sistema Laîsîte a hikûmeta nû ya Turkiyê

2- Berevanîkirin ji Îslamê
3- Berevanîkirin ji nasname û hebûna neteweya Kurd

Taybetmendiyên bizavê: Bizava han ku di meha Şibatê a sala 1925'an dest pê kiribû, di heyamek kurt de tev herêmên başûrê rojhilat yê Turkiyê bixwe ve girt. Hevdem tevî berfirehtirbûna şoreşê û pêkhatina dijberiyên di navbera heyeta wezîrên Turkiyê, Mistefa Kemal bi neçarî Ismet Înono, wezîrê Îslamîst yê ji kar derxistî, car din anî nava heyeta wezîran. Armanç ji vexwendina Înono bo Enqere, bas û gengeşe li ser bizava Şêx Seîd û hewl ji bo tepeserkirina wê di heyamek kurt de bû.

Balyozxaneya Bîrîtaniyayê li Turkiyê di rapora xwe de bi piştgirêdan bi hin belgeyan li Turkiyê dinivise: "Zirûfên heyî nîşan didin ku tevgera Şêx Seîd hin herêmên berçav ji Turkiyê xistiye bin desthilata xwe û beşek berçav ji hêzên leşkerî bona tepeserkirina wê bizavê, bo herêmê hatine şandin".

Çavkaniyên fermî yên Turkiyê dane zanîn ku bizava Şêx Seîd beşek ji siyaseta Bîrîtaniyayê ye ji bo livandina Kurdan li dijî hikûmeta nû a Turkiyê.

Di yek ji raporên dewleta Bîrîtaniyayê de, bi îşarekirin bi pêkhatiya kabîneya Turkiyê, hatiye: "Endamên Kabîne ji ber ku piranî nexwdiyê bir û baweriyên olî ne, derheq tepeserkirina bizava Şêx Seîd, hev deng û hev hizr in".

Dewleta Bîrîtaniyayê di yek ji raporên xwe de, giringtirîn sedemên pêkhatina bizava Şêx Seîd bi awayê jêrîn dide zanîn:

- 1- Bizav xwediye bingehên neteweyî û olî ye
- 2- Îdareyên dewletî qirêj û rîzyok(gendel) in
- 3- Kar û barên îdarî ên xelkê bi awayekî baş berbi pêşve naçin
- 4- Serederî tevî hêzên xwecih nebaş e

5- Nerazîbûna xelkê ji sistema birêveberî gihîştîye asta xwe ya herî bilind.

6- Xelk ji pesendkirina yasaya "Îxanet"ê xeydî



*** Lêkolîvan û nivîskarekî ciwan yê Rojhilatê Kurdistanê**

ne(Yasaya îxanetê ku piştî bi desthilatîhiştina Mistefa Kemal hate pesendkirina, pêkhatî ye ji cezayên tund bo kesên ku dixwazin ol tevî siyaseta bikin).

7- Xwendingehên olî tevî bertengkirinên dewletî berbirû ne.

8- Rêberên olî dikevin ber sivikati û bêhurmetîkirina dewletê

Di encam de, di roja 16'ê Avrîla 1925'an de, hêzên Turkiyê karin tevgera Şêx Seîd tepeser û wî û çend kesên din ji rêberên bizavê binçav bikin. Rêberên şoreşê di dadgehek leşkerî li Diyarbekirê de bi cezayê îdamê hatin mehkûmkirin. Di rapora balyozê Bîrîtaniyayê de hatiye ku bi tepeserkirina şoreşa Şêx Seîd, mezintirîn kirîza Turkiyê piştî bidesthilatgihîştina Mistefa Kemal, dawî pê hat.

Hukmê lidarvekirina Şêx Seîd û 40 kes ji hevalên wî li berrava 28'ê Nîsana 1925'an, piştî dadgehîkirinek rûyekî û bê belavkirina belgeyên têkildar, hate pejirandin. Her wiha destûra girêdana tev binkeyên olî li rojhilatê Turkiyê hate pesendkirin. Lê li belgeya hejmar 1867'an a birêz Hars ji bo rêzdar Oster Çîmbirîlî li Tîrmeha 1925'an, bi îşarekirin bi dadgehîkirina Şêx Seîd, îşare bi beşek ji axavtînen serokê dadgehê jî hatiye kirin ku tede serokê dadgehê, armanca Şêx Seîd ji bizavê bi awayekî zelal, "avakirina Kurdistanê serbixwe" dide zanîn.

Di begleya han de ji zimanê serokê dadgehê ve hatiye: " Hin kes ji we ji bo berjewendiyên takekesî û hinên din jî ji ber girêdayîbûn bi dujman û tamayîya siyasî beşdarî vê bizavê bûne, lê hûn hemû xwediye yek armanç bûn ku ew jî avakirina Kurdistanê serbixwe bû. Teverga xwe encama çend sal hewldan ji bo tevîhevîkirina herêmê bû, lê eva arteşa Komara Turkiyê bû ku bizava we bi awayekî herî baş kontrol kir. Hikûmeta Turkiyê tu çalakiyek siyasî û leşkerî a li dijî xwe napejirîne".

Bizava Şêx Seîd weke piraniya tevgerên din ên gelê Kurd, eger çî bi rûçîkek olî dest pê kir, lê di dawiyê de rûçîkek olî – neteweyî bixwe ve girt û di encam de li niqteya dawiyê de hewla xwe ji bo vêdebirina sîtema dagirkeran û bizavek olî guherî.

Hevdîtina Dr. Mehmûd Osman Tevî Deftera Siyasî A PDK Îranê



Siyasetvan û kesayetiyê navdar ê Kurd, **Dr. Mehmûd Osman**, êvariya roja 09.08.2008'an, serdana binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê kir û ji

aliyê birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî û endamên Deftera Siyasî ya vê partiyê ve bi germî hate pêşwazîkirin.

Di rûniştina navbera her du aliyên de, rewşa Kurd bi giştî û nemaze rewşa Kurd li Başûrê Kurdistanê û her wiha astengên ser rêya siyasat û armancên gelê Kurd ketin berbas.

Di beşeke din a vê hevdîtînê de, rewşa Îran û Rojhilatê Kurdistanê hate şirovekirin.

Şandeke "KNC"yê Bi Çend Rojnamevanan Re, Seredana PDK Îranê Kir

Roja duşem, 11.08.2008'an, şandeke Kongireya Neteweyî a Kurd li Amerîkaya Bakûr (KNC), bi serokatiya Dr. Kurmanc Gundî, tevî hejmarek ji



rojnamevanan, seredana Deftera Siyasî a PDK Îranê kir û ji aliyê şandek ji Partiya Demokrat bi serokatiya Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ve bi germî hate pêşwazîkirin.

Di hevdîtina navbera her du aliyên de, rêzdar Mistefa Hicrî, basek siyasî li ser rewşa Îranê û Kurdistanê û opozîsyona Kurdên Îranê kir û bi hûrî û berfirehî aliyên basê ji wan re şirove kir.

Her wiha şanda "KNC"yê, siyaseta rast û rola siyasî û neteweyî a PDK Îranê bilind nixand û li ser domandina têkilî û hevkarîya xwe tevî vê partiyê tekez kir.

Şiroveya Peyvên Siyasî



Berhevkar: **Omîd Esxeran**
omid_anbi@yahoo.com

KONSERVATÎZM

Konservatîzm ji têgiha "Conserve" û peyva latîni a "Conservare" bi wateya parastinê hatiye û di rêzaniyê de ji rêbaza miyanerewane û alîgirîkirina tund û tûj e ji

bîr, hizr û teradsyonên kevin pêk hatiye bi taybet di warê siyasî û civakî de û dijberîkirin e tevî her cure guhartinek bingehîn di pêkhatiya civakê de. Têgiha han zêdetir li hember radîkalîzmê tê bikaranîn, lê konservatîzm tenê ne li dijî radîkalîzm û hizra şoreşgerane ye û tevî sosyalîzm û sosyal demokrasî û her bîr û hizrekê dijhev e ku daxwaza guhartinê di bingeha civakê de ye.

Konservator yan jî miyanerew "Conserveur" kesek e ku hewlê dide rêzê ji bîr û hizrên olî, siyasî û civakî ên berê bigire û wan biparêze û tenê pûte û girîngiyê bide wan bîr û nêrînan ku demkî û hewce ne.

Di rastî de konservatîzm di nava xelkê Bîrîtaniyayê de xwediyê rêz û rûmeteke zaf e û ji bo takekesên wî welatî girîng e. Lewra partiya Parêzgarên Bîrîtaniyayê xwediyê girîngiyek zaf e di wî welatî de, çunku xelkê Bîrîtaniyayê gellek pêbend in li ser parastina bîr û baweriyên olî û malbatî.

Ji nêrîna miyanerewek Bîrîtaniyayî ve ewên ku dixwazin bi tundrewî û hin karên şoreşgerane deb û edetên kevin ji holê rakin, di şaşiyê de ne, çunku ew li ser vê baweriyê ne ku deb û edetên han li ser bingeha teoriyên bisûd ên bav û kalan hatine avakirin. Lewra digel tu yek ji bîr û hizrên bilez ên wan de hevhlê nabe. Bi vî awayî divê çavê me ji tiradîsyon û deb û edetên kevin be û rêz û hurmetê ji wan bigirin û vêc û qazanê herî zêde ji ezmûn û ceribînên bab û kalan werbigirin. Li Bîrîtaniyayê Îdmon Borg, filesofê bi nav û deng yê wî welatî wekî babê Konservatîzmê tê hesabandin. Filesofê han êrîşê dike ser tunrewî û rêbaza tundrewane û wê weke dijberê kultura giranbiha a berê dizane. Navhatî li ser vê baweriyê ye ku divê em sûd û mifahê ji bab û kalên xwe werbigirin û heke gunartin jî hewce bin, divê digel şekl û şewaza berê were guncandin. Di kar û barê siyasî û civakî û kargêrê de jî hin xelk hene ku li ser bîr û hizra bab û kalan pêbend in û rêz û hurmetê ji wan digirin, lewra em dikarin wan jî weke Konservator yan miyanerew bihesibînin.

Kesên miyanerew bi giştî xwediyê liv û lebatek navinc in û renge hin caran jî şewazeke nasyonalîstî a tundrewane bixwe bigirin. Partiya Parêzgarên Bîrîtaniyayê weke partiya herî binav û deng a miyanerew di cîhanê de tê hesabandin. Hin partiyên Rastrew ên din jî hene ku weke miyanerew tîen hesabandin, her çend ku ew ne xwediyê navek miyanerew in. Hin caran jî miyanerew ji bo wan partiyên tê bikaranîn ku daxwaza vê çendê dikin ku rewşa berê were vegeandin. Zirûfan han hin caran ji bo partiyên Çepgir û tunrew jî tê bikaranîn. Bo mînak li doma hevrikanêya hundirîn a nava Partiya Komonîst ya Soviyetê de berî hilweşîna wî welatî, hin girûpên ku li dijî Gorpaçof bûn, daxwaza vegeandin bo siyaseta miyanerewane a berê dikirin, lewra girûpên han weke miyanerewe hatin nasîn.

Çavkanî:

(Fehengî Ramiyarî Nîga) **Azad Weledbegî**
(Danêşnamêyê Siyasî) **"Political Dictionary"**
Daryûş Aşorî

Pîroz Be Cejna Gelawêja Kurdistan

15'ê Tebaxa Îsal, 63 sal bi ser avabûna PDK Îranê derbas dibe. Di 15'ê Tebaxa sala 1945'an, bo cara yekemîn di dîroka siyasî a xwe de, kurd bûn xwedî partiyeye bi armancên neteweyî, nûjen, demokrat û dîspîndar. Di 63 sal xebat û berxwedana azadîxwaziya vê partiyê de, gellek destkevên mezin û dîrokî hatine tomarkirin û partiyê pirr evraz û nişiv jî dîtine, lê di tu serkevtin û têkçûnan de, rê û rêbaza demokrat û neteweyî a vê partiya berpirsiyar ji bo rizgariya gelê Kurd nesekiniye û xebat û têkoşîna wê partiyê her dom kiriye û dike. Em bi rûmet û şanazî ve 63'hemîn salvegera avabûna PDK Îranê bibîr tînin û pîrozbahiyên xwe ên germ û gurr pêşkêşî gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, endam, alîgir û dostên vê partiyê dikin.

Desteya Weşana Agirî 15'ê Tebaxa 2008



Paşkoya Taybet Bi Boneya 25'ê Gelawêjê, 63'hemîn Salvegera Avabûna PDK Îranê

Hejmar: 93

Peyama Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK'ê, Bi Henceta 25'ê Gelawêjê, 63'hemîn Salvegera Avabûna Partiyê Ve

Civatên mafxwaz ên xelkê Kurdistanê!
Malbatên serbilind ên

Şehîdan û girtiyên berxweder ên siyasî!

Endam û alîgirên Partiya Demokrata Kurdistanê!

Pêşmergeyên çavnetirs û qehreman ên gel û partiyê!

Îro 25'ê Gelawêja 1387'an a Rojî (15'ê Tebaxa 2008), Partiya Demokrata Kurdistanê, partiya berdil û hezkiriyaya civatên xelkê Kurdistanê, partiya Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî, partiya Şehîdên birûmet ên neteweya me û partiya hezaran xebatkarên rêya azadî û demokrasîyê, bi rûmet û şanazî ve 63'hemîn xetîr (mom) a temenê xwe hil dike û her weke berê, piştrast û erxayîn bi alîkariya bêbin û berdeyam a xelkê azadîxwaz yê Kurdistanê û xebata şoreşvanî û bêrawestiyana a endam û alîgirên têkoşer ên partiya me, ji bo bidestxistina armancên neteweyî û demokratîk ên gelê Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de, gavên xurt û qahîm davêje.

63 sala berî niha, di bin tîrêja rênîşaniyên Pêşewa Qazî Mihemed û piştgiyaya civatên xelkê Kurdistanê di 25'ê Gelawêja 1324'an a Rojî (15'ê Tebaxa 1945)de, PDK li ser bingeheên rêxistinî ên Komeleya Vejiyana Kurd (J-K) hate avakirin. Damezrandina PDK Îranê di wê rewşa aloz û hestiyar de, bersîveke jêhatî û zanistî ji bo guhartinên kûr ên civaka Kurdistanê bû û nîşaneyeke ron û zelal a wê rastiyê bû ku ne tenê neteweya Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de, xwediyê hişyariya siyasî û netewî ye, belku xwediyê vîn û îradeyê qahîm û bihêz e jî, heta di bin dîspîna organîzasyonê xurt a siyasî de, bi kiryar û pratîk bi armanca bidestveanîna maf û azadiyên gel yê bînpêkirî bihê qad

**“ÎRAN Ê DEVERA
ROJHÎLATA NAVÎN LÎ
HEMBER DERWAZEYA
GUHARTINÊN GIRÎNG Ê
ÇARENIVÎSSAZ DE NE”**



û çepera xebat û berxwedana siyasî.

PDK Îranê, take partiya Kurdistanê ye ku di serdemê nemana siya stem, zordarî û çewisandinê bi ser beşek ji axa welatê me de, hate avakirin û armanc ji damezrandina wê partiya demokrat, bidestvegirtina desthilata siyasî li Kurdistanê û çespendina mafên neteweyî û demokratîk ên gelê Kurd di çarçoveya sistemeke siyasî a nûjen û hemdem de bû. Lewra piştî 6 mehan ji avabûna Partiya Demokrat a Kurdistanê, li ser tîrêja rênîşaniyên avaker ên Pêşewa Qazî Mihemed, yekemîn Komara Kurd, hate avakirin û ew komara demokratîk bû rûgeha hevî û xwezîyên civatên xelkê Kurdistanê û bûye mînak û sembola serbestî û rizgariyê ji hemû parçeyên Kurdistanê re.

PDK Îranê di doma 63 sala temenê teji rûmet û şanazî e xwe de, tevî du sistemen paşverû ên desthilatdar li Îranê, rejîmên Paşatiyê û Komara Îslamî, bêrawestiyana xebat û berxwedan kiriye û di vê rêyê de hezaran keç û xortên xebatkar ên xwe pêşkêşî baregeha azadiyê kiriye û li hember de, hezaran rûpelên zêrîn û rengîn di dîroka teji rûmet û serbilindî a xwe de tomar kiriye, lewra bi heybet û serfirazî ve, niha jî li ser piyan sekinî ye û têkoşîna azadiyê dimeşîne.

Partiya me yek ji wan partiyên sereke bûye ku roleke berbiçav di hiloşandina rejîma Paşatiyê de îstîyê, heta ji wê rêyê ve, bikaribe hemû maf û azadiyên gelê Kurdistanê misoger bike, bidest bixe. Lê mixabin! bi sedema nakokî û dijhevî û nebûna yekîtiya siyasî di navbera hêzên demokrat û pêşverûxwaz ên Îranê de, komek Melayên bîrtes û serhişk, bi mifahwergirtin ji wê rewşa bê ser û ber a siyasî, dest bi ser berhema xebata civatên xelkê Îran û Kurdistanê de girtin û bi vî awayî di heyamê sê dehsalên borî de,

**“PDK ÎRANÊ RÊZ Ê
HURMETÊ LÎ XEBATA JÎN,
XWENDEKAR, KEDKAR Ê
MAMOSTAYAN KU DÎ REFA
HERÎ PÊŞÊ A XEBAT Ê
BERXWEDAN TEVÎ REJÎMA
AZADÎKUJ A KOMARA
ÎSLAMÎ A ÎRANÊ DE NE,
DÎGÎRE Ê XEBATA WAN TEX
Ê ÇÎNÊN CIVAKA
KURDÎSTANÊ BÎ XEBATEKE
REWA Ê BERHEQ DÎZANE Ê
BÎ HEMÛ HÊZ Ê ŞIYANA
XWE PÎŞTEVANIYÊ JÎ WAN
DÎKE”**

desthilateke reş û kevneperestane bi ser Îranê û Kurdistanê sepanandin. Desthilatek ku heke em nebêjin di şêl û awayê xwe de bêminak e, aliyê kêr em dikarin bibêjin, yek ji sistêmên siyasî ên herî bênimûne û hovane ye ku heta niha dîroka mirovahiyê ceribandîye.

Hevalên hêja!

Her çiqas Komara Îslamî a Îranê, hemû awa û metodên serkut û qirkirinê li ser gelê Kurd û tev gelên din ên Îranê ceribandîye, lê ewa cihê hêviya xebatkarên siyasî ye, eva ye ku ew rejîma azadîkuj, serbarê wê hemû tund û tûjî û serkut û çewisandinê, nekariye ruhiye û morala berxwedan û şoreşê di nav dil û hundirê neteweyên Îranê de ji nav bibe û bikuje. Di wê xebat û berxwedana teji rûmet û serbilindî de, gelê Kurd bi dirêjahiya sê dehsalên derbasbûyî di refa pêşîn a xebatê de bûye û bêrawestan têkoşîn meşandiye.

Ew berxwedana neteweya me, dibe sedema rûmet û şanaziya me bi keç û xortên çavnetirs ên gelê me û her ew xebat û berxwedane ye ku PDK weke pêşeng û serkêşê tevgera Kurd di Îranê de hay dide, heta şîyan û karîna xwe bona rizgariya gelê me di bin barê giran ê zilm û stema neteweyî û dabînkirina hemû maf û azadiyên gelê me yê bindest derbixe holê.

Hevalên birêz!

Niha jî kirîz û qeyraneke kûr a siyasî, aborî û civakî rastî rejîma kevneperest a Komara Îslamî a Îranê hatiye û gelên Îranê û tev çin û texên wê civakê bi destê wê rejîmê dinalin, bêzar in. Niha Jin, Xwendekar, Kedkar û Mamosta di refa herî pêş a xebat û berxwedan tevî rejîma azadîkuj a Komara Îslamî a Îranê de ne. Lewra erk û wezîfeya hemû hêzên siyasî û demokrat ên Îranê ye ku ji wê xebata

**“HEWCE YE HEMÛ HÊZÊN
DEMOKRAT Û
PÊŞKETINXWAZ ÊN
ÎRANÊ Û KURDISTANÊ,
SEH BÎ BERPİRSIYARIYA
DÎROKÎ Û MIROVÎ A XWE
BİKIN Û TEV HÊZ Û
KARÎNÊN XWE JÎ BO
GIHÎŞTIN BÎ
PİLATFORMEKE HEVBEŞ
BİKAR BÎNIN KU TÊ DE
HİM DEMOKRASÎ Û
MAFÊN HEVWELATÎBÛNÊ
BÎ FERMÎ BÊNE NASKİRIN
Û HİM JÎ BAL BÎ
PARVEKİRINA
DESTHILATÊ DÎ FORMA
RÊVEBERIYA
FEDERALÎSTÎ BÊ DAYÎN”**



dilêrane piştgiriyê bikin û dengê xwe bixin kêleka wan dengên azadîxwazane. PDK Îranê, xebata wan tex û çînen civaka Kurdistanê bi xebateke rewşa û berheq dizane û bi hemû hêz û şîyana xwe piştewaniyê ji wan dike.

Hewwelatiyên delal!

Siyaseta maytêkirina rejîma Komara Îslamî di nav kar û barên welatên herêmê, ji berê bêtir xurt û zêde bûye û terorîzma dewletî ê bûye yek ji taybetmendiyên cudanekeirî ên wê rejîmê û hewl û cehda karbidestên rejîmê ji bo bidestxistina çekên komkuj û yek ji wan çekên Etomî, her dom dike. Derçûna 3 biryarnameyên dorpêçan ji aliyê Konseya Ewlekarî a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ve jî nekarî ye wê rejîmê ji siyaseta zêdexwazî û cewher û kakila radîkalîzma Îslamê poşman bike.

Bi berçavgirtina ew kirîzên hundirîn, herêmî û navneteweyî ên ku Komara Îslamî tê ketiye, hemû karnas û pişporên siyasî li ser wê baweriyê ne ku Îran û devera Rohhilata Navîn li hember derwazeya guhartinê girîng û çarenivîssaz de ne. Lewra careke din ji vê tirbûnê ve ez dubare dikim û dibêjim ku hewce ye hemû hêzên demokrat û pêşketinxwaz ên Îranê û Kurdistanê, seh bi berpirsiyariya dîrokî û mirovî a xwe bikin û tev hêz û karîna xwe ji bo gihîştin bi pilatformeke hevbeş bikar binin ku tê de him demokrasiyê û mafên hevvelatîbûnê bi fermî bêne naskirin û him jî bal bi parvekirina desthilatê di forma rêveberiya federalîstî bê dayîn, heta ku mafên gişt gelên bindest ên Îranê bihên dabînkirin. Ji bo mifahstandin ji bûyer û guhartinê pêşerojê tenê zamin û garantîyek heye, ew jî yekîtiyê û hevgerîna xurt û qahîm a siyasî li ser bingeha bi fermî naskirina mafên tev neteweyên pêkîner ên Îranê û cihgirbûna mafên gişt tex û qatên civakê ye.

Di vê derbarê de, PDK Îranê hest bi berpirsiyariyê tewaw dike û ji bo her cure hevxebatî û hevhelwestiyê siyasî û rastbînane amade ye û jê re hewlê dide û her destek alîkariyê di vê derheqê de bi germî digivişîne.

Di dawiyê de, li ser navê tim endamên rêberî, Kadro û Pêşmerge, endam û alîgirên Partiya Demokrat a Kurdistanê ve, 63'hemîn salvegera avabûna partiya me ya xebatkar pîroz dikim û hêvîdar im di pêşerojê de jî, partiya Şehîdên serbilind, weke herdem, partiya cihê hitbar û baweriyaya civatên xelkê Kurdistanê be.

Silav li 25'ê Gelawêja 24'ê, salroja avabûna PDK Îranê!

Silav li malbatên serbilind û birûmet ên Şehîdan û girtiyên siyasî û ramanê!

Silav li kêmendamen şoreşê, Şehîdên zindî ên xebatê!

Silav li xelkê Kurdistanê, piştewanên herdemî ên Partiya Demokrat!

Mirin û neman ji bo Komara Îslamî, dijminê azadî û mafên gelan!

**“JÎ BO MIFAHSTANDIN JÎ
BÛYER Û GUHARTINÊN
PÊŞEROJÊ TENÊ ZAMIN Û
GARANTÛYEK HEYE, EW
JÎ YEKÎTÎ Û HEVGIRTINA
XURT Û QAHÎM A SIYASÎ
LÎ SER BINGEHA BÎ FERMÎ
NASKIRINA MAFÊN TEV
NETEWAYÊN PÊKÎNER ÊN
ÎRANÊ Û CIHGIRBÛNA
MAFÊN GIŞT TEX Û
QATÊN CIVAKÊ YE”**

Dr. Xosro Ebdulahî:

DR. QASIMLOYÊ NEMIR HÎMDAR Û PÊŞENGÊ NAVNETEWÛYÎKIRINA PÎRSA KURD BÛ


X wendevanên hêja yên
Agirî, em li sere berê 25'ê
Gelawêj, 63'hemîn salvegera

avabûna PDK Îranê ne, Partiya Demokrat di heyamê xebat û tekoşîna xwe ya azadîxwazî de tûşî gellek evraz û nişîvan bûye, bedel û goriyên zaf dane, çendîn sermaye, sembol û karîzmayên netewî wekî Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî ji dest dane, lê bîr û hizir û ramanên wan tim çirayê rê û rêbaza vê partiyê bûye. Herwiha gellek destkevt jî bîdest xistine û rolek girîng di navneteweyîkirina pîrsa Kurd de lîstîye. Li ser vê mijarê, me çend pîrs raberî jî berpirsiyarê pêwendiyên navneteweyî yên vê partiyê, birêz Dr. Xosro Ebdulahî kirin û wî jî bi vî awayî bersiv dan:

Dr. Xosro, bi li berçavgirtina vê çendê ku heyamekî zaf e hûn li rêberiya PDK Îranê û her wiha berpirsiyarê pêwendiyên navneteweyî yên vê partiyê jî ne, bi raya we PDK Îranê çî rol û bandorek di navneteweyîkirina pîrsa Kurd de hebûye û heya çiqas di vê derheqê de serkeftî bûye?

Hevpeyvîn: Selîm Zencîrî

Partiya Demokrata Kurdistana Îranê, bi hatîna nemir Dr. Qasimlo û di bin rêveberiya wî de, girîngiyêke taybetî da pîrsa pêwendiyên navneteweyî. Ji bo vê yekê, Dr. Qasimlo, bi liberçavgirtina realîteyên heyî, çî di sewiya navçeyî û çî di sewiya navneteweyî de be, pîrsa Kurd li ser esasê hinek pîvan û prensîp pêşberî partiyên siyasî, rêxistinên



parastina mafên mirovî, dezgehên çapemeniyê, sazî û binkeyên dewletî û navneteweyî û civat û komeleyên çandî û ronakbîrî kir. Ew pîvan û prensîp evana bûn: exlaqê siyasî, rastgotin, demokrasîxwazî, wekhevîya jin û mêran, parastina mafên mirovî, dadperweriya civakî, mafê çarenivîs a gelan, aştxwazî, dijî tundûtûjbûn û çareserkirina kêşe û pîrsgirêkan ji riya aşti û diyalogê ve. Di vî karî de, Dr. Qasimloyê nemir tevgera gelê Kurd wekî tevgera neteweyî-demokratîk û wek ya gelekî xwedî çand û dîrok û wek faktorekî serbixwe û bi taybetî wek hêmanekî bîngêhîn yê demokrasîxwaziyê û demokratîzekirina deverê û bi taybetî welatên ku Kurd tê de dijîn, da nasandin û di pratîkê de jî ew pîvan û prensîp (çî di warê hundirî û pêwendî digel hêzên opozîsyonê û çî di warê hemberbûn digel hêzên rejîma Îranê de be), parast û bi kar anî. Her ji ber van yekane bû ku deriyê gellek cih û dezgehan di sewiya navneteweyî de ji Kurdan ra hatin vekirin. Wek nimûne: Çendîn rêxistinên navneteweyî yên mirovhez û însanî berê xwe dane çiya û dol û bajar û gundên Kurdistanê û di warên cur bi cur de û bi salan alîkariya tevgera Kurdan kirin û îro jî her yek ji wan mirovana bûne seffîrekî wefadar ji bo kêşe û pîrsa Kurd ya meşrû û adilane.

Bi giştî îro beşekî girîng ji rêxistin û

dezgehên navneteweyî, êdî tevgera gelê Kurd tevgera xwedan bandor di guhartinên navçeyî bi taybetî di warên demokratîzekirin, aşti û seqamgîriyê domdar ya siyasî de dibînin û êdî dizanin ku bê çareserkirina pîrsa Kurd bi awayekî demokratîk û însanî, di Rojhilata Navîn de behsa rewşêke aştiyane û seqamgîriya siyasî dê behseke bê naverok be. Bi awayekî din, Kurd îro di dinyayê de wekî faktorekî xwedan tesîr û amilekî şûndêner û pozetîf di navçeya Rojhilata Navîn de tê hejmartin. Di vî warî de rola Partiya Demokrata Kurdistana Îranê û bi taybetî

**“PDK ÎRANÊ
DERIYÊ
ENTERNASIYO
NALA
SOSYALÎST JI
BO HÊZÊN DÎN
YÊN KURD
VEKÎR”**

**“PÎRSA KURD
ANGO PÎRSA
NETEWÛYÛKÎ 35
TA 40 MÎLYON
ÎNSANÎ, ÇI DÎJMIN
BÎXWAZE ÇI
NEXWAZE, ÊDÎ JI
KÊŞEYA
NAVXWÛYÎBÛNÊ
DERKETIYE”**



Dr. Qasimloyê zana wekî hîmdar û pêşeng divêt nehête jibîrkin. Bo nimûne: ji bîr nekin ku ewa PDK Îranê bû ku deriyê Enternasyonala Sosyâlist(wek rêxistineke navneteweyî) ji bo hêzên din yên Kurd vekir.

Ji bo navneteweyîkirina pîrsa Kurd di qonaxa îro a cîhanê de, divêt partiya Demokrat çî rê û mekanîzmekê bide ber xwe?

Partiya Demokrata Kurdistana Îranê divêt her li ser wan pîvan û prensîpên ku min di bersiva xala yekemîn de behs kir, xebatê bidomîne û di çarçoveya wan pîvan û prensîpan de berjewendiya gelê Kurd biparêze. Ji ber ku di wê çarçoveyê de pîrsa Kurd êdî tenê pîrsa gelê Kurd

“KURD ÎRO DI DINYAYÊ DE WEKÎ FAKTOREKÎ XWEDAN TESÎR Û AMILEKÎ ŞÛNDÊNER Û POZETÎF DI NAVÇEYA ROJHILATA NAVÎN DE TÊ HEJMARTÎN”

namîne, belkî dibe pîrsa hemû mirovên demokrat û hemû rêxistin û dezgehên piştgirê azadî, demokrasî û aştiyê. Diyar e ku ji bo vê yekê, xebateke berdewam û sistematîk pêwîst e û di vî warî de wezîfeyê giran dikeve stûyê hêzên pêşeng yên wekî partiya me.

Bi baldan bi vê yekê ku dagirkerên Kurdistanê tim di cehda wê çendê de bûne ku pîrsa Kurd wekî pîrsek navxweyî û di çarçoveyek berteng de nîşan bidin, bi raya we PDK Îranê çawa dikare ji ew rewş û zirûfa heyîn di Rojhilata Navîn de

binavneteweyîkirina pîrsa Kurd sûd û qazancê bistîne?

Bi liberçavgirtina guhartinên ku di van 20 salên dawîn di cîhanê de pêk hatine, pîrsa Kurd ango pîrsa neteweyekî 35 ta 40 milyon însanî, çî dijmin bixwaze çî nexwaze, êdî ji kêşeya navxweyîbûnê derketiye û roj bi roj ji ber bi geşbûn û leyîstina roleke girîng di hevkeşe û muadilatên navçeyê de diçe.

Di Îraqê de Kurd rola yekemîn ji bo demokratîzekirina vî welatî diîzîzin. Di Îranê de, him Kurd xwedan roleke esasî ya xebata ji bo azadî û demokrasîyê ne û him jî hest û hisa neteweyî ya neteweyên din yên bindest di geşbûn û bilindbûnê de ye. Di Turkiyê û Sûriyê de jî tevgera gelê Kurd berdewam e û ji bo azadiyê xebateke girîng tê kirin. Bi giştî îro dewr dewra rizgariya neteweyên bindest e. Dewletên ku Kurdistan di nav xwe de parçe kirin, yan dê mafên neteweyî û însanî yên Kurdan di sistemeke Plûral û Federal de bi fermî binasin, yan dê ber bi parçe parçe bûnê biçin. Ev yeka bi taybetî ji bo Îranê ku welatekî pirneteweyî(multinational)ye, pêwîstiya acil û çaresaz e. Bi dîtina min, ew sistema ku di Îraqê de pêk hatiye, nimûneyeke baş e ji bo çareserkirina pîrsa neteweyî. Ji bo ku Kurd bikaribin bi başî ji firsend û mercên pêkhatî di cîhan û navçeya Rojhilata Navîn de îstifade bikin, pêwîstî bi danîna stratejîkîyê hevbeş û herwiha jî hevkarî û hevxeberîyê berpirsiyarane li ser esasê parastina berjewendiyên

“RÊXISTÎN Û DEZGEHÊN NAVNETEWYÎ DÎZANÎN KU BÊ ÇARESERKÎRÎNA PÎRSA KURD BÎ AWAYEKÎ DEMOKRATÎK Û ÎNSANÎ, DÎ ROJHILATA NAVÎN DE BEHSA REWŞEKE AŞTIYANE Û SEQAMGÎRÎYA SÎYASÎ DÊ BEHSEKE BÊ NAVEROK BE”

neteweyî yên gelê Kurd heye. Bê ku di kar û barên hundirî yên hev û din de dexaletê bikin. Her wiha bi taybetî di Îranê de, hewceyî bi hevkarî û hevxeberîyê digel hêzên demokrat û pêşverû, bi taybetî yên gelên bindest, heye.

Di vî warî de, Partiya Demokrata Kurdistana Îranê, bi avakirina Kongira Neteweyên Îranê, ji bo Îraneke Demokratîk û Federal, gavên baş avêtine. Lê divêt, di vî warî de wekî hêzeke pêşeng gavên hêj xurtir bavêje.

“ÎRO BEŞEKÎ GIRÎNG JÎ RÊXISTÎN Û DEZGEHÊN NAVNETEWYÎ, ÊDÎ TEVGERA GELÊ KURD TEVGEREKE XWEDAN BANDOR DÎ GUHARTINÊN NAVÇEYÎ BÎ TAYBETÎ DÎ WARÊN DEMOKRATÎZEKIRÎN, AŞTÎ Û SEQAMGÎRÎYEKE DOMDAR YA SÎYASÎ DE DIBÎNÎN”

Îdamkirin, Kuştina Vênî Ji Aliyê Dewletê Ye

Hemîd Muxtarî

Di cîhana îro û di sed sala bîst û yekan de, mirovahî tenê ne goriyê hejarî û xizani û nexweşyan û wd...

ye, belku ji aliyê dewletên dîktator ve jî mirov bi cezayê îdamê tîn mehkûmkirin û tîn daliqandin û jî mafê domandina jiyane bêpar dibin.

Cezayê îdamê, diyariyek e ku ji serdemê hovîtiye ve bi cî maye û herdem jî aliyê hukûmetên nedemokratîk ve weke yek ji metodên sereke bona tepeserkirin û bêdengkirina mirovên azadîxwaz û nerazî ji sîstema desthilatdar tê bikaranîn.

Îran yek ji wan welatan tê hesabandin ku di birêvebirina kiriyara han a hovane de, piştî welatê Çînê di pileya duyem de cî girtiye.

Rejîma Îranê tenê di roja yekşem, 27.07.2008'an, de di kiriyareke hov û bê mînak de, 29 kes ji xelkê Îranê bi buxtana qaçaxa madeyên sirker, têkdana civakê û kuştinê, daliqand. Di halekê de ku sûçê wan ne ew bû. Tawana wan beşdarî di meşeke nerazîbûnê ya aşîxwazane bû ku ji bo pişikkirina Benzîne hatibû lidarxistin.

Desthilatdarên rejîma Îranê bi anîna pasavên weke jiyana kesên sûçbar bê biha ye û bona pêşgirtin ji gorîbûna kesên din, divêt kesên tawanbar ji nav herin yan cezakirina xelkê û tirsandina wan ji cezakirina, pêşî ji dubarekirina çewtî û şaşiyê digire, lewra xelkê îdam dikin. Ew herwiha cezakirina kesên tawanbar, weke baştirîn rê jî bo perwerdekirina xelkê bona rêzgirtin ji yasayê dizanin.

Lê di rastî de rejîma Îranê bi îdamkirina xelkê, merem û armancên taybet bi xwe hene. Berevajî pasavên rejîma Îranê ku dibêje: Daliqandina sûçbaran, pêşî ji ducarbûna tawanê digire, divêt em bibêjin ku daliqandin ne tenê pêşî ji vê yekê nagire, belku gellek xisarên din ên civakî jî tevî xwe tîne.

Bo mînak: Dema ku kesek ji malbatekê dimire, bê şik dê li ser wê malbatê bandorên girîng hebe û ger kesê/a mirî serpereştê malbatê be, dê kirîz û xesarên civakî weke zarok û jinên xiyevanî û gellek xesarên din rastî civaka me bike. Erê gelo ew yeka jî nabe sebebê pêkhatina çend pirsgirêk û tawanên din?

Ji aliyek din ve çima dewletên dîktator bi destê xwe sermayeyên welatê xwe ji nav dibin? Em hemû baş dizanin ku heya zarokek digihîje temenê ciwanîyê, bi dehan milyon tûmen jêrê tê serfkirin da ku bikare bê nava civakê û weke kesek çalak ji bo pêşvebirina civakê xizmetê bike. Welatên bijartexwaz ên weke Kanadayê wê yekê bi başî fahm dikin û hêz û şiyane cîhana sêyem bê tu nirxekê zêdeyî civaka xwe a çalak dike. Ji bo kesên tawanbar bi cezayê îdamê, dikaribe cezayê zîdana heta hetayî bê diyarîkirin û jî hêz û şiyana wan bona



encamdana karên cur bi cur mifah were standin.

Lê di rastî de dezgeha Dad a rejîma Komara Îslamî ya Îranê weke hemû welatên din yê dîktator bona birêvebirina dadperwerî û yasayê nehatiye damezirandin, belku ji bo tepeserkirina her cure deng û nerazîbûnekê ji aliyê xelkê ve ava bûye û metodên weke îşkence, zîdanîkirin, daliqandin û... tenê û tenê bona mana rejîma Komara Îslamî a Îranê bikar tîne. **Mirov dema ku dibîne rejîma Îranê kesên weke Yeqûb Mîrnehad, tenê bi vê tawanê ku karê rojnamevaniyê kiriye û di malpera**

taybet a xwe de bi nivîsina mijaran, rexne ji desthilatdarên rejîma Îranê girtiye, didaliqîne, tê digihîje ku ger kesek tiştekê li dijî wan bibêje yan rexneyekê ji wan bigire, cezayî wî/wê mirin e.

Betalkirina cezayê îdamê, kiriyareke exlaqî ye û di bin desthilata sîstemeke weke Komara Îslamî de ku qet pêbend bi dadperwerî û wekhevîyê nîne, gellek zehmet e ku rêz ji canê mirovan bê girtin û jî bo betalkirina biryarên han yê hovane tenê rêyek li pêş me ye, ew jî neman û hilweşandina rejîma Komara Îslamî a Îranê ye.

Komara Îslamî Çalakekî Sivîl Yê Belûç Îdam Kir

Komeleya Çalakê Mafê Mirovan di Îranê de, diyar kir roja 4'ê Tebaxa 2008'an, **Yeqûb Mêhrnehad**, rojnamevan û serokê Komeleya "Ciwane Dengê Dadperweriyê", di girtîgeha navendî a bajarê Zahidanê

de hate daliqandin.

Yeqûb Mêhrnehad ku bihara sala borî hatibû girtin û pêvajoya dadgehîkirina wî bi awayekî neron derbaz dibû, di encam de, zivistana sala derbazbûyî jî aliyê dadgeha Zahidanê ve bi îdamê hatibû mehkûmkirin.

Komeleya ku wî berpirsiyariya wê dikir, ji ciwan û xwendekarên parêzgeha Sîstan û Belûçistanê pêk hatibû û jî bo pêşvebirina perwerde û çanda xelkê ve parêzgehê û alîkarîkirin bi xelkê xizan û belengaz û destkurt dixebitî.

Serbarê vê yekê ku hikûmeta Îranê xwediyê pileya duyem a îdaman di cîhanê de ye, lê daliqandina Yeqûb Mêhrnehad, wekî rojnamevan û xebatkarekî sivîl ku berê jî Efûya Navneteweyî û hejmarek rêxistinên çeleng ên parêzerên mafê mirovan, daxwaza betalkirina biryara îdamkirina wî kiribûn, béguman peyamek bixof û mergîner ji bo çalakên din ên sivîl, bi taybet mehkûmên bi îdamê wekî: Ednan Hesenpûr, Hîwa Botîmar, Ferzad Kemanger, Ednan Husênpenahî û wd.. dibe.



Zeyneb Bayezîdî Bi 4 Sal Cezayê Zîndanê Hate Mehkûmkirin

Rêxistina Parastina Mafê Mirovan li Kurdistanê da zanîn ku roja 09.08.2008'an, dema ku malbata Zeyneb Bayezîdî bona

agadarbûn li ser rewşa keça xwe seredana Dadgeha Şoreşa bajarê Mehabadê dikin, ji aliyê dadgehê ve tîn agahdarkirin ku Zeyneb Bayezîdî bi 4 sal cezayê zîdana "tezîrî" hatiye mehkûmkirin. Li gor biryara dadgehê, Zeyneb divêt cezayê han di girtîgeheke bajarê Zencanê de biqedîne.

Li gor çavkaniya han Zeyneb Bayezîdî gişt ew buxtanên ku jêre hatine lîdan, red kiriye û gotiye ku min tenê tevî kampanya yek milyon îmzeyan hevkarî kiriye û eva jî ne sûc e.

Her wiha malbata Zeyneb Bayezîdî jî di nameyekê de ji bo dadgehê nerazîbûna xwe derheq diyarîkirina vê cezayê ji bo Zeyneb Bayezîdî xuya kirin.

Li gor çavkaniya han, Zeyneb Bayezîdî bona xuyakirina nerazîbûna xwe derheq biryara dayî ji aliyê dadgehê ve û zext û givaşên ku di zîndanê de

dixin ser wê, dest daye gireva xwarinê.

Rêxistina Parastina Mafê Mirovan li Kurdistanê, serbarê mehkûmkirina biryara han a dadgehê, daxwaza dadgehîkirina Zeyneb Bayezîdî bi awayekî eşkere û dadwerane dike.



Hebîbulah Letîfî, Xwendekarê Kurd, Bi Cezayê Îdamê Hate Mehkûmkirin

Komeleya Çalakên Mafê Mirovan li Îranê ragihand: **Hebîbulah Letîfî**, xwendekarê rîşteya yasayê, li zanîngeha Îlamê û akinciyê

bajarê Sine ku di meha Çileyê Pêşîn a sala borî de, hatibû girtin, bi cezayê îdamê hate mehkûmkirin.

Hebîbulah Letîfî, çalakê sîvîl ku heyamekê jî endamê Komeleya Parastina Mafê Mirovan li Îranê bû, bi buxtana hevkarîkirin tevî girûpên dijber ên rejîma Îranê bi cezayê îdamê hate mehkûmkirin.

Hêjayî gotinê ye ku navhatî di dema destbiserbûn di ragirtîgeha îdareya ewlekarî a bajarê Sine de, dikeve bin îşkencê. Bi vî awayî navhatî tûşî xwînrejiya gurçikan tê.

Bi mehkûmkirina Hebîbulah Letîfî bi cezayê îdamê, hejmara çalakên siyasî û sîvîl ên Kurd yê mehkûmbûyî bi vî cezayî, gihîştê 8 kesên ku navê wan bi awayê jêrîn e: **Ednan Hesenpûr, Hîwa**

Botîmar, Ferzad Kemanger, Elî Heyderiyan, Ferhad Wekîlî, Enwer Husên Penahî, Erselan Ewliyayî û Hebîbulah Letîfî.



Kuştin û Birîndarbûna Du Kesan Li Devera Biradost A Selmasê

► Navenda Nûçeyan ya PDK Îranê da zanîn ku roja duşem, 11.08.2008'an, hêzên rejîmê li nêzik sinorên Îran – Turkiyê, kasibkarên gundê Goleşêxan li herêma Biradost a Selmasê didin ber êrîşa guleyan. Bi vê sedemê kasibkarek bi navê **Fehîm Husênrewendî** tê kuştin û kesekî din – birayê Fehîm- bi navê **Mûsa Husênrewendî** bi xurtî birîndar bû.

Hêjayî gotinê ye ku du kesên navhatî xelkê gundê Goleşêxanê ne.



Rojeva Civakê

Roja Navneteweyî Ya Ciwanan

Agirî- Beşa Civakî

► Ji sala 1999'an heta niha, roja 12'ê Tebaxê weke Roja Navneteweyî a Ciwanan hatiye naskirin û her salê ji aliyê Sekreterê Giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ve yek ji pirsgrîkên giştî û sereke ên ciwanan ji bo wê salê tê binavkirin.

Sindoqa Nifûsê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di rapora xwe ya sala 2008'an derbarê Roja Navneteweyî a Ciwanan de diyar kir ku aliyê kêm yek ji 4'ê a nifûsa cîhanê di navbera temenê 10 – 25 saliyê de ye. Eva vê yekê nîşan dide ku xulyaqetê cîhanê ciwan e û dikaribe bi hêz û şiyana xwe ya bê rade û mezin guhertinên kûr û mezin biafirîne û pêşketinan di civaka mirovahiyê de pêk bîne.

Îsal (2008) mijara Roja Navneteweyî a Ciwanan ji aliyê Ban Kî Mon, Sekreterê Giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ve sala "**Ciwan û guhartinên av û hewa: demek ji bo gavavêtinê**" binav kir. Di daxuyaniyekê de bi vê hencetê, Ban Kî Mon ragihand ku me hewceyî bi vîn û îradeya mezin û berfireh a ciwanan ji bo cîhanekê heye ku xwediyê hêz û vejeneke payedartir û paqijtir in. Çaxê ku ciwanên sala 2008'an bigihîjin emrê min, renga cîhan bibe ciheke xirab û nexweş ji bo jiyane. Wî diyar kir ku divêt ciwanên îro berpirsiyariya encama guhertinên av û hewayê bigrin stûyê xwe û xwe ji bo berlêgirtin ji vî pirsgrîkê berhev bikin.

Ciwan xwediyê hêzeke xurt bona guhartinên erênî ne û dikarin di hemû warên civakî, aborî, siyasî û çandî de rola xwe ya sereke bilîzin. Ciwan bi zanîn û pisporiya xwe dikarin her tiştî li gor normên pêwîst ên jiyane biguherînin û di rêya bexteweriya civakê de bixebitin. Sistemên rêveber û desthilatdar encamên karî û şiyana û bandora erênî a hêza ciwanan di civakê de ewle û garanî dikin.

Berevajî pêvajoya girîngîdan bi hêz û şiyana ciwanan, hikûmeta Komara Îslamî a Îranê nifûseke zêdetirî 25 milyon ciwan ji 70 milyon şênîya welat ku temenê wan di navbera 15 heta 35 saliyê de ye, rastî gellek arîşe û pirsgrîkên civakî û aborî kirine û jiyana wan bi dijwarî dibore. Fenomenên weke betalî û bêkarî, bengdarî (tûşbûn bi madeyên hişber), fehşa, bêhêvîti û gellek nexweşiyên ruhî û psikolojîk ên din. Jiyana û çarenivîsa ciwanên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ji van bela û arîşan û gellek yê din ne dûr e, li bajarên Kurdistanê jî diyariyên han ên rejîma Komara Îslamî bi ser jiyana ciwanên Kurdî jî zal bûye û mirov dikare bi hebûna vî rewşê pêşerojêke tarî û cihê tirsê ji bo nifşa ciwan a Kurdên Rojhilatê Kurdistanê re bibîne. Rastiyên berbirû ên jiyana ciwanên me li Kurdistanê şahidê herî baş e...

TIXÛB

ADAR JIYAN
adarjiyan@my.net.com



Mirov, ji ber ku tixûban di mêjîyê xwe de datîne, her tiştî li gorî zanîna xwe ya kûd û tixûbdar

disenîfîne û bi vê feraseta xwe ya teng û têlewaz dike ku tixûbekî li dora bêtixûbiyê deyne. Bi rastî ev tixûb, tixûbê zanîna mirov a kêma û tixûbdar e. Belê ev fikr û hizra bitixûb, tixûbekî çêkirî li dora ji zanîn û hişmendîya mirovahiyê datîne.

Li gorî vê ferasetê, tiştekan an mezin an jî biçûk e; an kin kin an jî dirêj e; an qels an jî xurt e; an nizm an jî bilind e. Ango tu dibetiyê nade guherbariya mezinahî an jî biçûkatîyê; ihtimalê nade kinî an jî dirêjîyê; mikûniyê nade nizmî an jî bilindahiyê; gengaziyê nade qelsî an jî xurtîyê. Heçku tiştekan hem mezin hem jî biçûk e. Dîsa, hem kin û hem jî dirêj e; hem nizm hem jî bilind e; hem qels hem jî xurt e. Bo nimûne, hêştir mezin e; belê heman gavê jî biçûk e. Li gorî çî biçûk, li gorî çî mezin e? An jî çî mezintir û jî çî biçûktir e? Hêştir ji hespê mezintir, belê ji nehengekî (balînayekî) biçûktir e. Dîsa, mar dirêj e; belê heman gavê jî kin e. Li gorî çî dirêj, li gorî çî kin e? Mar ji marmarokê dirêjtir e; belê ji werîsekî kintir e. Her wiha gir bilind e; belê heman gavê jî nizm e. Li gorî çî bilind, li gorî çî nizm e? Li gorî deştê bilind, belê li gorî çiyê nizm e.

Mirov dikare der barê xurtî û qelsiyê, xweşikî û zistiyê, qelewî û lewaziyê, xweşî û nexweşiyê, dûrî û nêzîkiyê, dewlemendî û xizaniyê û hwd. jî gellek mînakên berbiçav bide. Belê encam heman tişt e. Yanî mirov nikare tu tixûb û tixûbên misoger li bar tu tiştî deyne. Çimkî her tişt bi reng û awaya xwe, ji dijberê xwe tê çihêkirin û veqetandin.

Başî û nebaşî, qencî û xerabî, rastî û şaşî, heqî û neheqî jî wisa ne. Li gorî nêrîn û feraseta mirovan tişt têne guhertin û têne tixûbdarkirin. Gellek tişt bi hin mirovan xweş tên dîtin; belê bi hin mirovên din jî nexweş têne dîtin. Dîsa gellek kiryar bi hin kesan wekî tiştên baş têne qebûlîkirin; belê bi hin kesan jî wekî tiştên xerab têne qebûlîkirin. Her wiha gellek tiştên ku ji hêla hin mirovan ve wekî neheqî têne dîtin, ji hêla hin mirovan din jî tê kirin, ji hêla hin mirovên din ve jî wekî heqdarî têne pejirandin. Ango rastiya hin kesan, dibe şaşîya hin kesên din. Guherbarî her gav dibe

sedema dualîbûna tiştan jî. Ji bo wê, ji bilî rêbaz û qalibê formulasyonên derezanistî her tişt guherbar e. Û tu tixûb ji bo wan tiştan nîn e. Tixûbê ku li dora wan têne rapêçandin jî, tixûbên ku di hiş û mêjîyê mirov de hatine danîn in.

Ji bar ku tixûb li bar hest, hêz û hizra mirov hatine danîn, ew nikare xwe rakêşe derveyê van tixûbên çêkirî û guherbar. Ji jiyana mirov bigirin heta bejn û bala mirov, ji mala mirov bigirin heta, mal û milkê mirov, ji axaftina mirov bigirin heta fikr û ramana mirov, ji xaka ku mirov bigirin, heta gund û bajarên mirov, ji erdnîgariya mirov bigirin heta welat û niştimana mirov... her der û her tişt bi tixûbên stûr û çêkirî hatine dorpeçkirin û fesilandin. Tu tişt nemeaye ku tixûb jêre nehatibe danîn.

Ji do heta îro, tiştên ku mirov arasteyî perestîna û hebandîna zordarî û desthilatdariyê dikin jî dîsa ev tixûbên ku li bar hêz û taqeta mirov hatine danîn in. Ji roja ku mirov bi mirovahiya xwe hesiyaye û heta îro, ji bar hizr û zanîna xwe ya bitixûb, an hawara xwe kiriye hêzeke bêtixûb an jî xwe spartîye xweda(yekî) an jî xwedewnedeke ku tixûb ji hêz û heza wî/wê re tune ye. Singê Gellek tixûbên bistrî yên ku mirovahiyê di mêjîyê xwe de raçikandine hin bi hin riziya. Belê dîsa jî li dewsa wan tixûbên bistrî, tixûbên ku bi sedan sal neyên rûxandin di navbera xwe û hemcînsên xwe de daniye. Her ku zanîn û hizra mirovahiyê pêş de çûye, hin tixûbên kevn rakirine, belê li dewsa wan, tixûbên xurtir û kambaxtir ava kirine. Ev tixûb, tixûbên ku mirov bar bi benîti, koletî û dîlîtiyê vedikin bi xwe ne.

Tixûbên ku mirov di hizr û kiryarên xwe de pêk anîne, bûne tixûbên zanîn û hişmendîya mirov û mirovahiyê bi xwe jî. Belê her çendî ku ev tixûb hin caran hatibin firehkirin û dorhêlîkirin jî, bi tevahî ji holê ranebûne. Ew tixûbên ku îro li bar her tiştî û her têgihê hatine danîn, berdeyama wan tixûbên çêkirî yên ku di goşa xwezaya bêtixûb de mirovahiya hemdem ditengijîne û diesirîne ne. Ev tixûbên çêkirî û demdemî ne derfetê didin azadbûna mirov û ne jî jîn û giyana wî/wê.

Kaniya Helbestan

NAME

Narîn Omer



Dema
nameya te ya dawî
gihîşt
min danî
li ser maseya yekroyoyê
azada Mihemed Şêxo
ya şêrîn ez azad kirim
ji arandinê jî nê
destarê Tehsîn Taha
ez di xewnerojên har de
zivirandim
Fincana Cegerxwîn
bersiva ezêtiya min da
bi hatina Mah Şerefîxan û
Rewşen Bedirxan
tu dibêjî:
asaya çîhanî
vajî di zivire
Îro ez darê şikestî me û
Tu...wax...wax!
Na...na
Ez û tu
Du tirhikên pîrozî ne
Yek darê
em bi can û cendik
Kirin e
Dibêjî:
Tu dojehî
lewra biryara
koçberiya me
Ji buhuştê za
Hevalo...
Leqamên ne berhev
Li min neke
Raste...
Pênûsa dîrokê dibêje
Ez peryek ji baskên te me
Lê dîsa min dibîne bingeha
Hebûn û mayîne
Çimko buhuşt di nav pîyên
Min de hatiye damezrandin
Hevalo...
Evînyek bê hêz
ji te navi
Baş dizanim
Tu çelengî
Heta sistbûna xwedê jî
Tu çeleng û melewanek
Lehengî di derya halana
Rostem û Kawa de yî
Şûrê Firorîtiş û Deyok
Di nav birhên xwede
Te parastîye û çîroka
Evîniya xwe ji baskên
Leyla Qasim û
Cewadê Hemawendî
Vehûna ye û
pênc dergehên
firîştî radane û
pênc mûm
bi dil kirine û
vedane

Bi Kurt Kurmancî Hizir Û Bîra Azad

Ji mêt ve ta roja îro, dîtî û çiloyîna "Hizra azad an pênuşa azad" di danûstandinê de ye, hêj

zelal ne bûye.

Di bawerîya min de, ta ku nûbûn di jiyânê de hebe, ta ku mirovanti berdwam be, dê hizir û pênuşa azad, di gengeşê û danûsatandinê de, li ber xwe bidin. Wek ku diyar e, hizra azad an pênuşa azad ew e ku, mirov di ramanên xwe de rastbêj û durist be. Û ta ku mirov di ramanên xwe de weha be, gerek tu qeyd û bend li dor nebin. Bi azadî bikaribe ji xwe re jiyaneke taybet helbijêre, bêyî ku hizir û ramanên bi kotekî li ser bêne ferzkirin.

Heger neferek ji civatê di hizra xwe de azad be û civata li dor, ne li gor wê azadiyê be, li ber hizir û ramanên wî nekeve, angû di hizir û ramanên wî de ne gihêje, hingê hizir û ramanên wî neferê/a ku xwe azad dibîne, dibin barekî giran li ser milê wî/ê, hem jî li ser civata wî. Hingê pêdeviye ku desthilatek hebe, wê civatê li hev ragire. Desthilatek bi yasa be, ku rêveberîya civatê bike û yasayên xwe, li ser tev takekesên civatê bimeşîne, da ku cemawer di çarçoveke yasayî de bi xêr û xweşî biparêze û derbas bike.

Eger em bèn ser "pênûsên azad",

qonaxa girîng ji hizra azad. Ez ne bawerim ku pênuşk azad hebe û ew pênuşk ne di bin siya sansorê an terorê de be. Nexasim di welatên cîhana sisyan de. Di van welatan de sansor rola xwe dilîze, ji ber alozî û gengeşeyên azadî û demokratîyê û sansora ku heye politîkî ye bêtir ji civatî. Ji ber ku desthilatdarên welatên cîhana sisyan ji nivîskarên bi tirs in, her dem û gav tawa nivîskarên di dilê wan de ye. Vêca sansora rejîmên wan dewletan rola xwe dilîze û şert û mercên xwe ferz dike. Her wiha nivîskar bêçar e, di bin siya terorê de dijî û ji bêçarebûn sansoreke kesayetî (zafî) li ser xwe û berhemên xwe datînin, da ku berehmên xwe ji sansora rejîmên wan dewletan biparêze û derbas bike!

Di bawerîya min de, ev sansora xwebixweyî ku nivîskar li ser ramanên xwe datîne, ji sansorê dewletê xerabtir e. Eger sansora dewletê perçeyek ji nivîsandina nivîskarekî ku azad be, di nivîsandina xwe de, xetso bike, nivîskar bi sansora xwe ya xwebixweyî (şexsî) nivîsa xwe tevî xetso dike.

Nivîskarê/a azad, ew nivîskar e ku di hizir û ramanên xwe de zelal be, di nivîsandinên xwe de rastbêj be, li navdariya, li ser pişt çend qedexeyên civatî negere wek:

Êrîşkirina li ser olê û hetîketiya bedena jinê.

Hizra azad, pênuşa azad, di zelalkirin û eşkerekirina şaşî û xerabiyên civatê de ye. Ew şaşî û xerabiyên ku civat

Konê Reş -Qamişlo

ji ber bandora wan paşketî dimîne.

Heger nivîskar mêr be, bi cegerdarî be, wê di nivîsandinên xwe de şerê wan şaşî û xerabiyên civatê bike, bê ku sansorê li ser xwe û berhemên xwe deynê. Gereke wan şaşyan ji cemawer re raxîne ber çavan, da ku cemawer wan şaşyan nema bike û di ser wan re biqevêze, wan li pişt xwe bihêve û hin bi hin ber bi xêr, xweşî û avakirinê ve bilive. Lê mixabin di welatên cîhana sisyan de, nivîskarên weha kêmtêne dîtî ku hebin jî, wê di zindanan de bin. Erê nivîskarên, ku sansora dewletê an a xwebixweyî li ser berhemên xwe daynin, divê di zindanan de bin!

EGER HAT, Û*....

Heta ku ji min têt, bi qasî ku wext dest dide û nivîs jî bibêje, min bixwîne, bêyî ku bibêjim ev ev e,

ew ew e; nivîsên ku diweşin dixwînim.

Gellek nivîskar, bi nivîsên xwe yê bi tahm û çêjdar refikeke xweşbîniyê di dîwarê dilê min de vedikin.

Bi min du ziman hene; yek zimanê dil, yê din zimanê mêtî.

Herdu jî, di nivîsekê de, bi qasî ku dikarin yekîtî û xemleke bêhempa pêk werînin, di heman nivîsê de dikarin berê xwe ji hev biguherin, weke ku me got yek berê xwe bide dil, yê din mêtî ji xwe re bike armanç.

Mella gotiye, 'Qulzema dil îşq e!
Lê ya mêtî?

Zanîn, - ne zanîna ku pêşyan gotiye 'yê ku zane zane, yê ku nizane baqê nîskan e'- ku nebe bi meriv re, û meriv xwe mişt nekiribe danegirtibe bi ezmûnên berî xwe, di 'darê dinyayê' negihîştibe, nizanibê bê dinya li dora xwe çawa diloqe; civatê nas neke, deshelatê nebîne, li hemberî rêveçûna ku ditewtihe bi wî alî wî alî de helewesteke mirovane û mêrane wernegire bi wêrekî... û vêya jî bixe stûyê 'nezanîne'?! Zana jî car caran weke gellek kesan 'cilik' bi ser serê xwe dadikin, xwe li kerrahiyê datînin û dibêjin ne min dît ne min bîna!

Wey...zana?!
Zana, berî her tiştî ne 'şeqlbaz û hoqqebaz e!
Û weke ku gotine, 'fituyê di bêrika xwe' nagerîne!
Bi hêz e, lê na 'yê hêzdar' e.
Û, ji ber ku divê ew nûnerê wêrekîyê be û zirav bide yê li dû xwe hêza livê bide wan; derba pêşî, derba rastiyê lazim e ku ew; yanî zana di kelehên neheqî û bêdadiyê werke!
Lê wexta ku zane, ji nezanan tirsonektir be?
Tirs jî mîna cureyên nexwaşinan cur be cur in!
Lê tirsek heye, ku bi paxila mirov girt evçend bexil e, evqas bêdelîl e... tişt a meriv ya herî pîrozwer bi mirov dide firotin: Tirs a birçîbûnê!
Dema ku min nivîsa Şêxmûs Sefer ya ku her bend bi 'Eger hat û...' dest pê dike xwend, bistekê ponijîm, di ber xwe de min wêrekî û newêrekiya xwe teqiland; bi dû re daketim 'sûka wêrekîyê' li bazarê geriyam, li tevî xwepêşandanên civakî, siyasî bûm.... Û min guhê xwe da peyvên xişn û xapînok yê bazirganan:
Hêviyê didêrin hêviyê!
Xweziyê didêrin xweziyê
Hêvî; kaya li ber bê!

Xwezi çivîkê li ser darê!

Jarê jaro, nanê tîsî be jî hêvî jiyân bêhêvî nabe!

Lê hêviya ku di nivîsê de dihat hêvîkirin, ji hêviyê wirvetir,

destdanîna ser birîne bû.

Li vir ya herî baş, berî ku berê nivîsê bidim kaş; dorê bidim nivîsa Şêxmûs Sefer, û mefera ku hûn jî li tevî wî bibêjin, 'Eger hat û...' bidim we:

'Eger hat û tu xwe mecbûrî nivîsê bibînî, di ser de jî nikaribî hevokekê binivîsî yan tu ji xwe ne razî yî yan jî ji nivîsê...

Eger hat û girî wekî kenê ji ber xwe fedî nekir di nav civatê de jin nema bi şerpayan ber devê xwe digirin...

Eger hat û zilam bi zarokan şa bûn di nava kolanan de, êdî zarok dikarin bi derenceyên mirovî hilkişin ser piyan û dinyayê xweştir bibînin...

Eger hat û qîzek hivdeh salî gava birayê wê ew li cem yekî dît û tenê silav da wan û derbas bû û keçik ji tirs a xwe ji avahiya heftan neavêt xwarê, d,ê li wî welatî gul sortir vebîn...



Arjen Arî, Amed
30.07.2008

Eger hat û bajarê te derî vekir ji nasnava te re û te neşiband xwe wê gavê welatê te hinekî din rizgartir e...

Eger hat û zimanê te meşiya, pêşiya te li nav mirovên welatê te, êdî hewce bi tanq û topan nemaye...

Eger hat û me bi "siyasetî" negot "rojbaş" pê re jî me got sibaha we bi xêr be û bi şevbaş re me got şeva we ya mayî xweş be ma wê şevbuhêrkên me venegerin şevên xwe gelo...

Eger hat û zimanê siyasatê qulibî, siyasatmedarên me tirkî li wasitayeke ku firênê wê teqiyayî sarkirin serberjêrkî û kurdî jî li pišta xwe kirin bi kaşkaşkî, wê gavê dê Cegerxwîn helbesta "ey heval Robson" bixwîne ji wan re, di mezal de...

Eger hat û zimanê bav û kalan nebû hinceta ku tenê siyasat li ser bê kirin û jê pê de nebû parsekê ber deriyê sazî û rêxistinana ma hîn em ê çî bixwazin...

Eger hat û piraniya ew kesên ku li ser navê me di parlemantoyan de, di şaredariyan de siyasatê ji bo me dikin gelo bi zimanê gelê xwe bizanibûna û ya baştir bipeyivana ji hêla civaknasiyê ve ma wê tiştêk sosret bû ya...

Eger hat û dengbêjê welatên min wekî solîstê filan komê bihata naskirin û moçadî nan û ava tîsî nebûya strana Çeto Lawo beleheq wê nehatiba gotin...

Eger hat û helbestvanê me, rewşenbîrê me nivîskarê me, peykervanê me di paneleke wêjeyî de yan jî di pêşengeheke de gavekê li "pêşiya" siyasatmedarên me bisekine bêhemdê xwe û ev yek wekî tiştêk asayî bihata dîtin, dê terfiyê kê biketa yan jî dê kî/ê biçûk biketa...

Eger hat û siyasatmedarên kurdan di hilbijartinekê de- çî komele çî sazî û çî jî rêxistinên siyasî -piçikekî mutevazî bibûna û xwe nekirina berendam, di ser de jî komîsyona heylî biçûya cem wan û bigota wî/wê "em pir dixwazin hûn di vê hilbijartinê de bibin endamê me" ma wê dinya biqeliya...

Eger hat û wî/ê kesî/ê bigota "zor memnûn im, filankesê yan jî filankeso ji min baştir dikare bike" ma gelo hespê Îskenderê ku dinya kiribû gavek, dikarî me kurdan ji nû de zevt bikira...

Eger hat û dawiya dawî "welatparêzî" tenê ji bo welat bihata kirin, me yê sed hezar carî bigota û bilîlîlîlî*
Ew roj wê bîn, gelo?
Ez bi hêvî me!

Bi qasî ku dizanim hevî 'nanê tîsî' ye!

*Taxa Filla, Şêsmûs Sefer, Malpera

Diyaname

Dengê Rojava

Sunday Teter-Hunermendê Jibîrkirî

Besam Mistefa



Cara pêşî min wî dît dema seredana Hewlêra paytext kir û bû mêvanekî ezîzî me di Kombenda

Kawa bo Çanda Kurdî de. Ew ji kampa xwe dihat-ne ji mala anjî ji bajarê xwe: Ew bê mal û bajar e-niha piştî 7 pêşangehên taybet û 11 pêşangehên bikom ew li konekî ji yê penaberên kurdên sûriyê yê ku derbasî Herêma Kurdistanana Îraqê bûn piştî serhildana 12'ê adara sala 2004'an, ji tîrsa tolsitendina gur û hovên rêjîma Beesiyana. Sunday jî wekî xeynî xwe li kampa Muqbilê li kêleka Duhoka rengîn bicî bû, ew li welatê xwe penaber e niha. Dema hat, konê xwe yê piçûk ku bi zorê têra alavên wî yê muzîkê û kaxez û şixat û botl û tiştên wî yê piçûk dike, ev tiştê ku Sunday parçeyên hunerî ên ciwan ji wan dirust dike, li pişt xwe hiştibû.

Tembûra wî li ser milê wî bû, tembûra ku wî bi xwe çêkiriye tevî alavên dinê, bihna Amûdê û ked û westanê ji rûyê wî difûriya. Amûda şewitî ji rûyê wî yê esmer û temenê wî yê bi sî û du zivistan xemlandî dihat. Fediyokî bû weke tabloyên xwe yê ku agir girte ser wan di bin kon de yan jî zarokan ew xira kirin ji pişt wî ve! Ew jî zarokek e ku zaroktiya wî jê hate dizîn û ji ber guhnadan û jibîrbûn û tozê, lingê wî bi şeşê ketin. Êdî ew şel e!

Ji ber ku cara yekê bû min ew didît, û ji ber ku koma wî ya muzîkê û alavên wî pêre bûn (wî dixwest rojekê li Amûdê komeke muzîkê ava bike, lê mirin û koçkirin û belavbûna dost û hevalan û kêr derfetiyê û hwd! rê nedan; êdî wî bi xwe komeke xwe çê kir), min jê daxwaz kir ku parçeyek muzîk yan stranekê ji min re bêje.

Hêdî hêdî wî alavên xwe yê ecêb derxistin-hertîstê wî, wî bi xwe dirust kiriye-pêşî tembûra xwe ya mezin û delal

derxist û alava ku bi xwe çê kiriye û nav lê kiriye **Zarîn** û piştê harmonîkaya xwe jî derxist û di heman demê de li hemûyan xist. Stranek li ser cejna Newrozê çê kiribû, yekser ji nav tiliyên wî derbasî nav dilê min bû, carek û du car û sê caran lêda û ez têr nebûm.

Qasim yan jî Sunday Teter-evê jibîrbûyî-kurdekî xwedî talênt û xewn û arezû ye. Ew muzîkvan û şewekar û nîgarkêş û peykertaş û karîkatorîst e. Li Rojavayê Kurdistanê li bajarê Amûdê di sala 1975'an de ji dayîk bûye. Înstîtûta hunerên şewekariyê li paytexta sûriyê, Şamê qedandiye û gellek pêşangehên karîkator û nîgarkêşî û peykeran li Amûdê û Şamê saz kirine, û li Herêma Kurdistanana Îraqê jî li Hewlêra paytext û Duhok û Sîmêl û Zaxoyê.

Teter hunermendekî jibîrbûyî ye, êşeke kurdî ya rojane ye. Huner û jiyane derbasî hertîstê ku tiliyên wî digihiyê de dike. Ji pel û kaxezên rojname û kovaran, tabloyên hunerî çê dike, ji botlên kola û manderînan peykeran çê dike, li ser tep û daran peykeran wêne dike û wêneyên bi zeytê jî çê dike, bi ser de jî helbestan bi zimanê kurdî dinivîse li ser xerîbî û penaberî û êş û azarên gelê kurd û agir û şewatên ku laşê zarokên bajarê wî di demekê de daqurtandine. Li Cizîra kurdan ya li sûriyê gund bi gund geriyaye û pêşangehên wêneyan saz kirine, ji mala xwe hetanî ku tabloyên wî avê vedixwin di bin axa hewşê de ji ber tîrsa hatina polîs û zîlam-gurên rêjîma faşîst û ne mirovî. Bi ser hemûkî de jî, ji ber ku ew endam bi endam hatiye jibîrkirin û tu kes guh nadiyê de, ew carina wek karkerê boyaxkirina dîwarên malên xelkê jî kar dike, ji bo ji birçîna nemirê û di jiyane de bimîne.

Lê belê çî jîyan! Rojên Sunday ne jê ne



û dûrî dil û hest û hunera wî ne. Ew tiştêkî naxwaze ji bilî çiyekî ku têra alavên wî yê muzîkê û tiştên wî yê piçûk bike!

Çiyek ku karibe bi rehetî têde bigirî bê ku kes wî bibîne. Çiyek ku têde di nav xewn û xeyalên xwe de bi serbestî melevaniyê bike. Çiyek ku karibe bê ku destûrê ji kesî bixwaze têde bimire.

Heta ji we were, vî navî ji bîr bekin: Sunday Teter!

Bexşdariya Sîlvana Xelkê Neçar Bi Betalkirina Avahiyên Wan Dike

► Heyamek e ku Bexşdariya Sîlvana ser bi devera Tirgower a Urmîyê, bi pêkanîna zext û givaşan bo ser xelkê gundê Rajanê, hewlê dide da ku wan neçar bi betalkirina mal û avahiyên ku ketine bin rexê cadê yan avahiyên ku xelkê di zeviyên xwe de çê kirine, biherifînin û biçîne ciheke din.

Ji aliyekî din ve, Bexşdariya Sîlvana daxwaz ji xelkê gundên Dolepêsan, Xirê, Hiloî û Mîrava kiriye ku bona çêkirina avahiyên neçin gundê Rajanê. Eva di halekê de ye ku gundên han seba çêkirina bendava Noşanê, ketine bin avê û xelkê van gundan bê mal û avahî ne.

Her wiha Bexşdariya Sîlvana pêka nameyeke dadgehê, çend kes ji xelkê gundên han bang kirine û ji wan daxwaz kirine ku xanîberên avahiyên xwe hiloşînin, lê kesên han li hember vê daxwaza Bexşdariya Sîlvana nerazîbûna xwe xuya kirine.



Hêjayî gotinê ye ku ji aliyê dewletê ve tu hevkarîyek bi wan kesan re nehatiye kirin.

Lîstikên Olimpiyada Havînî A 2008'an Bi Coşeke Germ Dom Dike

► Olimpiyada havînî a 2008'an ku bi awayekî fermî bi navê "Lîstikên Olimpiyada bîst û nehan" tê naskirin, ji 8'ê Tebax 2008'an dest pê kir û heta 24'ê Tebaxê dê li bajarê Pekîne li welatê Çînê bêlîdarxistin.



Di Olimpiyada 2008'an de, herî balkêş, dîmenên rê û resma vekirina Olimpiyada han bû ku di dîroka Olimpiyadê de, dîmenên herî bêminak bûne û bala her kesî kişandin aliyê xwe û Çîniyan hunermendbûna xwe nîşan dan. Dîmenên han coşeke mezin da milyon mirovan li seranserê cîhanê.

Bi giştî 10 hezar û 500 werzişvan beşdarî Olimpiyadê bûne. Lîstik di 28 rîşteyan de birêve diçin. Lîstikên Olimpiyada havînî her çar salan cerekê li dar dikeve.

Weşana TRT'ê Ya Kurdî Ji Sala 2009'an Re Ma

► Malpera Diyarnamê'ya da zanîn, weşana TRT'ê ya Kurdî ji sala 2009'an re ma.

Midûrê Giştî yê TRT Îbrahîm Şahîn got ku xebatên ji bo TRT Kurdî hatine asta dawî û di destpêka sala nû (2009)




de dest bi weşana bi zimanê kurdî û zimanên din yê biyanî bikin.

Tê gotin ku renga nava kanalê TV5 be û dê 24 saetan weşanê

Birevin Heta Hûn Pîr Nebin

► Bez an revîna berdwam û rêk û pêk, pêvajoya pîrbûnê di jiyana mirovan de kêma dike. Li gor rapora BBC'ê, lêkolîvanên Amerîkî ragihandine ku revîn û helatina berdwam û bi bernamê dikare pêvajoya kalbûna mirov bi awayekî berçav paşde bixe.



Di vê vekolînê de hatiye îflankirin, kesên ku temenê

wan di naverasta jiyana de ye, dema laşê xwe bi revînê adet didin, kêmtir ji kesên hevtemenên xwe rastî mirinên nişkêve û heta penceşêr (kanser)ê dibin. Lêkolîna han li ser 500 jin û mîrên pîr di dema 20 salan de, li hember hejmareke wisa kal ku tu liv û tevgerê wan di vê heyamê de nebûye, hatiye encamdan, encama lêkolînê nîşan dide ku 34 ji sedê a wan kesan ku ne revîne, di vê heyamê de mirine û tenê ji sedê 15 a kesên ku reviyane, rastî mirina ji ber pîr û kalbûnê hatine, lewra werziş û bi tayber helatin li ser tendurustiya mirovan gellek bi bandor e.

Jina Herî Bejnîlind A Cîhanê Jiyanê Xwe Ji Dest Da

► Jina herî bejnîlind a cîhanê di 53 saliyê de, jiyana xwe ji dest da.

Sendî Alen, jina Amerîkî ku weke jina herî bejnîlind a cîhanê hatibû hesabandin, 2 metr û 33 Cm bilind bû.

Di pirtûka rekordaran a "GUINNESS" de, Sendî Alen weke jina herî bejnîlind a cîhanê hatibû binavkirin û piştî wê jî jinek ji Çînê di pileya du de cih girtibû.

Sedema mirina wê, hebûna mîkrobek di xwîna wê de, nexweşiya Şekirê û xirabûna her du gurçîlken wê hatiye zanîn.

